Fachhochschule Nordwestschweiz
Pädagogische Hochschule

# ESKON *Sprache*

**E**rfassung **s**chulischer **Ko**mpetenzen **N**euzugezogener

# KURDISCH KURMANCI


Aufgabenset 3 bis 4 Jahre Schulerfahrung

© Pädagogische Hochschule FHNW 2022


**Erk**

1. Fermanan bişopîne û tiştên rast bixe hundirê giroverokê.


   a. Kûçik, bizin û hesp bixe hundirê giroverokê.



   b. Pêlav/sol, gore û kinc bixe hundirê giroverokê.



   c. Tasik, sênîk û kêr bixe hundirê giroverokê.








© PH FHNW

2. Fermanan bişopîne û tiştên rast bixe hundirê giroverokê.


   a. Li kêleka restorantekê dikana xalê min/apê min heye. Gulên wî yên li ber avahiyê niha pir mezin bûne. Hefteya bê ewê gelekî kar bike ku firotineke mezin pêk bîne. Dikana xal/ap bixe hundirê giroverokê.



   b. Li pola me maseyên nivîsê bi awayekî girover hatine bicihkirin. Maseya Marias li kêleka deriyî ye. Gelek pirtûk li ser maseya Mariasî hene. Maseya Mariasî bixe hundirê giroverokê.



   c. Li parka me cihekî lîstinê heye ku gelek zarok li wir dilîzin. Dayik li binê daran li ser kursiyên dirêj rûdinin. Dayika Christians li ser kursiyê dirêj li kêleka kulîlkan rûdine. Dayika Christians bixe hundirê giroverokê.





© PH FHNW

3. Ji bo vî wêneyî, nivîsa li gorî wî bibîne. Nivîsê bixe hundirê giroverokê.



| | | |
|---|---|---|
| Ji bo rojbûna xwe kurik xwarina herî zêde jê hez dikir xwest: Miqarne (maqarna). Dayika wî jê re sêniyeke tije anî û çêja wê (tahma wê) pir xweş bû. | Hefteya borî kurik matmayîneke mezin jiya. Apê wî (xalê wî) istaqozek danî ser sêniyê. Ew ecêb xuya dikir û lepûşkên wî yên mezin hebûn. | Kurik hez dikir biçe serdana dapîra xwe. Ew her dem jê re xwarinên li xweşiya wî diçin çêdike. Doh wê pasteyeke bi çûkolata çêkir. Wî qetekî mezin jê xwar. |


© PH FHNW

4. Nivîsê bixwîne û bersiva rast bi xêzka çepûrast diyar bike.

Kûçik û mirov xwediyê çîrokeke dirêj a hevbeş in. Hinek kûçik bi awayê kovî dijîn, hinek wekî nobedar xizmeta mirovan dikin. Kûçik dikarin di jiyana rojane de kesên çavên wan nabînin jî bibin û bînin, mînak, gava bixwazin di trafîqê re derbas bibin. Kûçik li tevahiya parzemînan hene û ew ji nêz ve dibin xizmên gur û roviyan.

a) Kûçik li her aliyê cîhanê hene
rast ☐
çewt ☐

b) Kûçik dikarin di jiyana rojane de alîkariya mirovên çavên wan nabînin bikin.
rast ☐
çewt ☐


c) Kûçikên kovî qet nemane.
rast ☐
çewt ☐

d) Gur xizmên kûçikan in lê belê rovî ne xizmên wan in.
rast ☐
çewt ☐



© PH FHNW

5. Nivîsa di derbarê vî wêneyî de bi dengê bilind bixwîne.



**Şêr û Rovî**
Demekê şêrekî kal hebû. Ew ji bo here nêçîrê bike pir lewaz bibû. Ji ber wê yekê ji xwe re li qulekê (şikeftekê) geriya. Xwe li wê derê bi cih kir.

Dilê ajalên din li ser keyayê ajalan şewitî. Yek li pey yekê hat serdana şêrî.

Rojekê rovî hat serdanê. Ew li ber şikeftê (qulê) rawestiya. Şêr deng lê kir got: „Were hundir. Ji bo hatina pêşwazîkirina te, ew hêz di min de nemaye.“

Roviyî bersiv da, got: „ Ez dixwazim li der ve bimînim û rawestim heta mêvanên te yên din herin. Ji ber ku ez dibînim, hinek şopên ajalan tên hundirê şikefta te, lê belê yek jî paş de venegeriyaye.“



© PH FHNW

6. Ji bo tu bersivên li jêrê bidî, nivîsa di erka 5 de bixwîne. Cihên rast ango çewt bi xêzkê nîşan bike.

a) Di seranseriya çîrokê de şêr di hundirê qulê de (şikeftê de) dimîne. rast ☐ çewt ☐

b) Rovî diçe hundirê qula (şikefta) şêr. rast ☐ çewt ☐

c) Şêr ajalên din xwariye. rast ☐ çewt ☐



© PH FHNW

7. Ka bêje bê nivîsa di erka 5 de li ser çi ye.



© PH FHNW


8. Nivîsa di erka 5 de bixwîne û bersivên pirsên li jêrê, bi devkî bide.

   - Tu bawer dikî ku şêr nexweş bû?
   - Rovî ji ajalên din qurnaztir bû? Tu dikarî ji min re bêjî bê tu çima wisa dihizirî?
   - Tu dihizirî ku em dikarin ji vê çîrokê tiştinan hîn bibin? Tu dikarî ji me re bêjî bê tu çima wisa dihizirî?



© PH FHNW

9. Ji 5 wêneyan yekê hilbijêre û bêje bê tu kîjan pîşeyî (karî) dibînî.














© PH FHNW

10. Gava tu mezin bibî, tu dixwazî kîjan pîşeyî (karî) bikî, li ser bihizire. Li vir nivîseke kin li ser binivîsîne.



© PH FHNW